

SERKEFTİN

www.tevgerakomunist.com

Hejmar: 16

Dîrok: Nîsan 2025

Biha: 1000

DENGÊ ŞOREŞ Ü AZADIYÊ



Bijî 1ê Gulanê Bijî Sosyalîzm

2

NERÎN:

Bijî 1ê Gulanê, bijî yekîtiya karkeran

3

JIN:

Destûra Demkî Vîna Jinên Sûriye
Temsîl Nake

4

ROJEV:

Deklerasyona TKŞê:
Ji Bo Jîyaneka Azad û Wekhev
Têkoşînê Mezin Bikin

6

CIWAN:

Xwendekarêن Şoreşê

Bijî 1ê Gulanê, bijî yekîtiya karkeran

Di her peyva ku em bal dikişinin ser têgihiştina xwe ya îro û erkên xwe yên siyâsî em neçar dimînin ku em ji şerîn cîhanê yên emperyalîst ên 1emîn û 2yemîn dest bi mijarê bikin. Ji ber ku hemû dane nişan didin ku em di rojê berê yên şerekî nû yên cîhanê da ne.

Çi qewimîbû?

Şerê parvekirina emperyalîst ê 1emîn, cîhan li ser hîmê zorê xistibû nav "pergalekê". Lê statûkoya emperyalîst hîna zêdetir nikarîbû berdewam bike. Şerê Cîhanê yê 2yemîn dema ku xwedî xisleta şerê emperyalîst yê dabeşkirina giştî ya li ser bingeha cîhana kapîtalîst bû, ji bo Yekîtiya Sovyetê xwedî xisleta şerê parastina welatê sosyalîst ê û şerê têkbirîna faşîzmê ji bo gelên cîhanê girtibû ser xwe. Di rastîyê da, ev cewhera dualî ya şer, piştişer wê xwe di ragihandina du pêkhateyêni dijber ên navneteweyî yên siyâsî-leşkerî yên wek NATO û Pakta -Peymana Varşova da xwe bide xuyakirin. (kovara Teoriya Marksîst)

Ji salê 1950î vir ve di navbera herêmên hegemonyayê yên Peymana Varşovayê û NATOyê da hevsengîyek pêk hat. Lê belê, ber bi salê 90an ve, bi hilweşîna Sovyeta revizyonîst, hevsengîya aborî, leşkerî û siyâsî ya cîhanê guherî. Rûsyâ bi bandora xwe ya herêmî, hêza xwe ya leşkerî, çavkanîyê xwe yên dewlemedîn bin erd, nifûs û kapasiteya xwe ya hilberînê bû yek ji dewletênbijîmar a emperyalîst a cîhanê. Di salê 2000an da, Sîn-Çîn bi hilberîna plankirî, hêza erzan a kar û bi nifûsa xwe ya zêde bû müşraqeka din a emperyalîst. Qezenc, îstîsmar, hegemonya zagonê bingehîn ên kapîtalîzmêne. Ji ber vê yekê di şertîn kapîtalîzmê da hemû hevsengî nisbi û demkî ne. Hemû tifaq li ser esasa berjewendîyen emperyalîst in.

Ü îro di şert û mercen qeyrana hebûnî ya kapîtalîzmê da pêşbazî-reqabet û nakokîya di navbera emperyalîstan da her ku çû tûjîfir bû. Di heyama hevsengîyê da hiqûqa burjuva ya ku têkîliyê beramber saz dikir ji holê rabû. "Heyama hêza kê têra kê bike", têkîliyê hêza gerdûnî ya bi şewaza mafyayê dest bi serdestbûnê kir. Trump, dikare bi rehetî

Yekîtiya Ewropayê (YE) ya ku bi salan e bi wê ra tifaqê stratejik çekirîye, bi taybetî gefan li NATOyê dixwe û mijara dagirkirina Kanada û Gronlandê bîne rojevê.

Trump niha, mîna ku ew ne yên Ukrayna nextistine şer û mîna ku ne ew in yên ku piştigirî didin hikûmeta Zelenski, tinazê xwe li Ukraynayê dike. Niha dibêjê "çaresarîya xwe bixwe bibînin û em ê mîneralîen we yên hêja ji we bistînî!". Ukrayna û Zelenski mînaka baş a dawîya yên ku bi bendê emperyalîstan dadikevin bîre ne.

Yarastîşerê Rûsyâ û Ukraynayê şerê Rûsyâ û NATOyê bû. Dê Rûsyâbihata peritandin û Sîn ji bihata dorpeçkirin. Yek ji hedefîn xwe ji bi vê hincetê li Rojhilata Navîn, li ser Sûriye lawazkirina Sûriye û ji bo operasyoneka nû ya li ser Îranê kîrhatîkirina şertan bû. Bi taybetî Dewletên Yekbûyi yên Emerîka (DYE), emperyalîstên rojava û hevkarê wan ên Ereb ku bi hemû hêza xwe li hemberî berxwedana Filistinê li kîleka Îsrailê bûn û her cure piştigirî dan, li dijî navendîn berxwedanê yên li dijî DYE yên li Rojhilata Navîn ên ku bi emperyalîzma rojava ra ne yek bûn, êrîşeka yekgîrî pêk anîn. Hizbulah qels kirin. Hamas paş xistin. Esed hilweşandin.

Dixwazin bi rakirina ji holê ya Filistinê ya ji dîrokê, dawî li doza Filistinê bînin. Xwesteka ku Xezayê bikin gundê bedlane ne fenteziyeka, rasterast heqareteka ku weke bîrdozîyî, siyâsi û exlaqî ya ku li dijî civakekê hatîye kirin e. Ev kanciyeka raqisîna bi pêlîkirina ser cenazeyan e. Wayê pergala nû ya emperyalîstan dejenererbûnêka vîjdanî û exlaqî ya ûsa ferz dike û dixwaze vê rewa bike.

Esad hilweşandin. Li dewsa wî, Heyet Tahrîr Şam (HTŞ) li Şamê bicihkirin. Baş e lê gelo HTŞê ji BAASê demokratiktir e? Bi rastî rejîma BAAS ji ber ku anti-demokratik bû hat tesfiyekirin? Herkes dizane, ne DYE, ne Îsrail, Türkiye, Erebîstana Seûdî û ne ji dewletên din ên emperyalîst û paşverû yên herêmê xwedî rojeveka wek demokrasîyê ne. Şkenceyêni li girtîgeha Sednaya bi rojan di rojevê da bû.

Haydê kiryarênu HTŞê kirin duh bû. Em îro bawer bikin ku guherîye. Baş e lê, li ser êrîşen qirkirin, komkuji, destavêtin, tacîz û revandîna li ser Elewiyan ên li Lazqîye, Hama û Humsê ci bê gotin? Ma ev karê komek çeteyêni ji HTŞê serbixwe ne? Ma qey ew ê kî bixapînin? Me ev yek li Efrîn, Şengal û Reqqayê dît û jîyan kir. DAIŞ ji HTŞ ji, ji heman cawî hatine çekirin.

Tevî xislet û dosyeya súcen HTŞê ji, Şam radestî wan hat kirin. Çima HTŞ li hemberî Rêveberîya Xweserîya Demokratik a Bakur û Rojhilatê Sûriye ya ku hêza herî demokratik û rîexistinbûyi ya herêmê ye, hate tercîhkirin? Eşkere ye ku ji bo emperyalîstan mijar tu carî nebûye mafêni mirovan, mafêni netewî, demokrasî û azadî. Yekane dirûşmeya wan stratejî û siyaseta berjewendîyen emperyalîst e.

Helbet şoreşger û komunîst ji nakokîyen di navbera emperyalîstan da ji bo gel Süd werdigirin. Di vê xalê da xala sereke ya cudahîya welatparêzên sosyalîst ew e ku di hemû politikayê tifaqê dajî bo berjewendîyen karker û kedkaran cih bigirin. Li vir rîgez dikevin dewreyê. Her têkîliyeka bêrêgez jirêderketineka helbeperest-oportunîst û liberalîzmê dihewîne û xeter e. Welatparêzên Sosyalîst heta dawî şoreşa Rojava ya dijmîtingehkar diparêzin, lê erka birina ber bi sosyalîzmê ya vê şoreşê dafînin pêş xwe. Ji ber ku di şert û mercen şoreşa demokratik da nîrê mîtingehkar tê şkenandin. Ü ev gav, serkeftineka pir mezin e. Lê nakokîya ked-sermîyan û nakokîya zayendî ji holê ranebûye. Çareserîya vê nakokîyê; bi li dewsa milkê taybet, milkê kolektif, li dewsa cihê hilberîna kapîtalîst a reqabeta azad ji aborîya civakî, aborîya plankirî û bi serdestîya meclîs û komînên karker û kedkaran gengaz dibe. Ev yek bi karker û kedkaran herêm û cîhanê ra avakirina têkîliyê enternasyonal pêwîst dike. Welatparêzên sosyalîst weke spartî van rîgezan tifaq, guftûgo û têkîliyê rewa dibîne.

Amadekarîyê dewletên emperyalîst, mîtingehkar û dagirker ên ji bo şerî 3yemîn ê cîhanê berdewam dike. Her kes li gorî ev rewşa nû helwestekê digire. Xuya ye ku yek ji stûnên sereke yên Şerî Cîhanê yên Sîyemîn ji Rojhilata Navîn e. Rola jeopolîtik û jeostratejîk a Kurdistanê ku bûye çar parce, gelekî girîng e. Şer di heman demê da heyamên ku çîna burjuvaziya serdest û dewletên wan diperitîn e. Ev ji bo bindestan derfetên şoreşgerî çedike. Armanca welatparêzên sosyalîst ew e ku karker, kedkar, jîn û gelên bindest ên ji hemû netewe û bawerîyan li ser bingehêke anti-kapîtalîst, anti-emperyalîst, anti-mîtingehkar û wekhevîya zayendî, enîya xwe ava bikin.

Dema ku em ber bi 1ê Gulanê roja yekîti û têkoşîna karker û kedkaran ve diçin, di çarçoveya vê armanca stratejik da divê em li Rojava û hemû bajaren Sûriye yekîtiya karker û kedkaran bê ferqa bawerî û netewî, ava bikin. Di vê pêvajoyê da divê em li ser rol, wate û hismendîya çîna karkeran di civînen karkeran û civînen yek bi yek da li her derê perwerde bi rîexistin bikin û hismendîya çîne bilind bikin. Divê armanca me avakirina meclîsîn karkeran be.



Endama Desteya Rêveber a Meclîsa Jinên Sûriye Arîfe Bekir bal kişand ser komkujiyên li dijî gelê Elewî û jinên Elewî yên li rojavayê Sûriye bi destûra demkî ya ku ji alîyê HTŞê ya faşist a cîhadîst ve hatîye amadekirin û li ser zêdekirina hevgirtina jinan a li hemberî van êrîşan nixand.

WEKE DESTÛRA HEYAMA BAAS

Di vê destûrê da jin çawa hatine pênasekirin?

Qeyrana li Sûriye bû sedema rûxandina rêveberîya Beşar Esad. Piştî rûxandina Esed, bi serokaftîya Ehmed El Şara (Ebû Mihemed El Colanî) hikûmetekî nû hat avakirin. Di hikûmetê nû da fermandarênceteyan yên weke Ebû Emşa jî cih girtin. Bi ser da jî makezagonek hate çekirin. Wekî Destûra heyama BAASê ye. Komên bawerîyen cuda û hemû gelên Sûriye tê da ne xwedî maf in. Jinan li Sûriye û Rojava gelek şer kirin, gelek şehîd dan, gelek hatin girtin û di zindanan da man. Gelek destkeftî jî hatin bidestxistin. Lê li gel vê têkoşînê jî di derbarê mafêñ jinan da destûr pir qels bû. Li Sûriye gelek gel û bawerî hene. Hem divê ev kes bibin xwedî maf û hem jî hemû jin bibin xwedî maf. Divê destûr, ji bo ked û têkoşîna jinê guncav be. Sûriye demokratîk bi vê destûrê pêk nayê. Ji ber ku ev destûr tenê li ser yek netew, yek al, yek ziman û yek çandê hatîye avakirin. Sûriye dewleteka pirreng û pirneteweyî ye. Ew ê ji bo yek neteweyek

Endamê Rêveberîya Meclîsa Jinên Sûriye Arîfe Bekir: DESTÛRA DEMKÎ VÎNA JINÊN SÛRIYE TEMSÎL NAKÊ

destûrek navendîparêz be. Ji ber vê yekê em weke Meclîsa Jinên Sûriye vê destûrê qebûl nakin, red dikan. Em destûreka demokratîk dixwazin ku mafêñ hemû gelqan têde bin.

EM HEMÜ JINÊN SÛRIYE HEMEZ DIKIN

Em bûn şahidê êrîşên zayendparêz ên çeteyên HTŞ û Artêşa Azad a Sûriye yên li dijî jinên Elewî. Weke Meclîsa Jinên Sûriye xebatêñ we yên hevbeş bi jinên jî netewe û bawerîyen cuda ra hene? Armanca we çi ye?

Bi alîkarîya dewleta Tirk û piştgirîya wan, çeteyên weke Tûgaya Hemze, Ebû Emşa û Sultan Şah, li Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî kiryarêñ xerab li dijî jinan pêk anîn. Niha li herêmén beravêñ Sûriye li dijî jinên Elewî êrîş têñ kirin. Bi rastî bi êş e. Weke jinên Kurd tiştên ku hatine serê jinên Elewî, Ermenî û Durzî em naxwazin û qebûl nakin. Êşa me jî yek e. Li ku derê jinek were lêdan, girtin û kuştin, heman tişt wekî ku tê serê me ye. Ji ber vê yekê weke Meclîsa Jinên Sûriye têkilîyê me bi hemû jinên Ereb, Durzî, Ermenî û Suryanî ra hene. Li gelek parêzgehêñ Sûriye; Li Lazqîye, Suweyda, Hums, Şam û Helebê navendêñ me hene. Em hemû jinên Sûriye hemêz dikin. Em dixwazin bi yekîtiyâ jinên Sûriye guhertinan li Sûriye û destûra wê pêk bînîn. Em armanc dikin

ku jinan ji koletî, zilm û mirinê rizgar bikin. Werin em netew û bawerîya wan ci dibe bila bibe, bi jinan ra bi hev ra bijîn. Ji ber ku di êrîşen li ser Şoreşa Rojava da û di Sûriye da bi taybet ên ku êş kişandine jin in. Ya ku zarokêñ xwe wenda kirîye ew e. Ew jina ku mala wê wêran bûye. Ji ber vê yekê em dixwazin jin bibin yek, em dixwazin jin li tevahîya Sûriye bi rêxistin bibin. Werin em li Sûriyeyeka demokratîk û wekhev bijîn.

DÊ JIN JÎ DI KOMÎTEYÊN PEYMANÊ DA BIBIN

Di encama lihevkirina Şam û QSDê da komîte hatin avakirin. Gelo dê jin bêñ temsîkîrin?

Li ser navê hikûmetê Sûriye Ehmet El Şara (El Colanî) û li ser navê QSDê birêz Mezlûm Ebdî lihevkirinek pêk hat. Ji heş hêmanan pêk dihat. Komîte hatin avakirin. Komîte dê di dema pêş da xebatêñ

xwe bidomînin. Jin jî dê bi wan komîteyan ra bixebeitin. Dibe ku hebûna jinan ji alîyê hikûmetê Ehmed el Şara (El Colanî) ve neyê qebûlkirin. Lê ji alîyê me ve wê jin di komîteyan da hebin. Ger tifaqeka wiha hebûna jinan qebûl neke, em weke Meclîsa Jinên Sûriye tu carî tifaqeka wiha qebûl nakin. Divê jin hebin. Em jî dişopînin. Em di wê bawerîyê da ne ku jin dê di van komîteyan da cih bigirin û mil bi mil di van komîteyan da bixebeitin.

Di dawîyê da, bangek we ji jinan ra heye?

Weke jinên Kurd, jinên Sûriyeyî, jinên Bakur û Rojhilatê Sûriye banga me li jinên cîhanê ye. Êşa me jî yek e. Li ku derê jin lê hebin, pêwîstî bi piştgirîya jinan heye. Pêwîst e jin li hemû cîhanê dengê xwe bilind bikin û ji bo demokrasî û civaka azad bixebeitin. Ger jin azad nebe civak jî azad nabe.



Pêşeroj Em in! Em Di 1ê Gulanê da Derkevin Qadan!

Komunîst ên Şoreşger li qadan daxwazên xwe bilind bikin.

Tu jî:

- Ji bo mezinkirina têkoşîna li dijî serdestîya mér li cem me be.
- Ji bo têkoşîna li dijî tacîz, destdirêjî, tundîya mér, îstîsmariya zarakan li cem me be.
- Ji ber dagirkerîya Tirkîye ya li Serê Kanîyê, Efrîn, Girê Spî herî zêde em wek jin rastî zilmê hatin. Ger ku tu jî dibêje êdî em dixwazin bi ewlehî vegerin axêñ xwe li cem me be.
- Ger ku tu jî dibêje bila keda hundîre malê xuyanî be! xwedîkirina zarakan, xwedîkirina nexweş, kal û pîran, karêñ hundîre malê bila ne xêrxwazî be, bila bibe karê gelemerî li cem me be.
- Ger ku tu jî dibêje yên li zevîyê diçînîn em in, lê yên

- Li Lazqîye, Tertûs, Hama, Hums û Suveydayê jin ji alîyê çeteyên dewleta Tirk va di komkujiyan ra hatin derbaskirin. Ger ku tu jî jineka ku ji axêñ xwe hatîye dûrxistin î li cem me be.
- Ger ku tu li dijî pêşnûmaya makezagona HTŞê ya ku jinê tune dihesibîne ye li cem me be.
- Ger ku tu li dijî dewleta Tirk û çeteyên wê yên ku li Tişrînê kujerên Zozan Hemo, Ronîza Mihemed Elî, Menîce Heyder û Hezna Ebdî dibêje ku "Tişrîn em in" li cem me be.
- Ger ku li dijî yên ku naxwazin di rêveberîyê da, li ser sîleh, di qadêñ kar da jinan bibînîn tu jî dibêje em li vir in, li cem me be.
- Ger ku tu jî dibêje yên li zevîyê diçînîn em in, lê yên

ku keda wan nayê dîtin dîsa em in, ji bo ku tu denga xwe bilind bikî li cem me be.

Me li Rojava bi şoreşa jinê gelek destkeftin bi dest xistin. Lê hîna gelek mijarêñ ku em têbikoşin hene. Li dijî yên ku me tune dihesibînîn li cem me be. Ji ber ku hêza me ji yekîtiyâ me tê. Li dijî hepsî navbera çar dîwaran hatin kirin hêza herî mezin hêza rêxistinkirî ye. Em li dijî pergala baviksalar a ku bi gotina "jin kurmê jinê ye" me ji hev dûr dixe destê xwe bidin destê hev. Azadî, edalet û wekhevî dê bi destêne me yên ku bigêhêje hev û têkoşîn dike were.

Bijî 1ê Gulanê!
Jin Jîyan Azadî!

Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ)



Gelî Jinên Lêheng

Karker û kedkarêñ cîhanê di roja 1ê Gulanê ya Têkoşîn û Piştgirîyê da ji bo ku daxwazên xwe bînîn ser ziman amadekarîya derketina qadan dikin. Em ê jî weke şervan, parêzvan û kedkarêñ şoreşa Rojava, weke Jinên

Beşek Ji Danezana TKŞ'ê ya ku di 4ê Adarê 2025an de hatibû veşandin:

Ji Karker û Kedkar, Jin û Hemû Gelên Bindest ên Rojhilata Navîn ra Bangewazî;

EM JI BO JÎYANEK AZAD Û WEKHEV TÊKOŞÎNÊ MEZIN BIKIN!

REJÎMA BAASÊ HAT RÛXANDIN, NIHA DEM A GELAN E

Gelê Sûriye di dawîya şerê navxweyî yê 13 salan da ji rejîma BAAS a mêtîngehkar rizgar bû. Rejîma Şamê ya ku bi alîkarîya Rûsyâ û Îranê li ser lingan bû, hilweşîya û Beşar Esed revîya. Lê dîsa jî jîyan ji bo gelê Sûriye venegerîyaye rewşa asayî.

Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) ku dest danî ser hikûmeta Şamê, bi awayekî zelal nîşan da ku mafê hebûna netewe û civakêñ cuda yên bawerîyê nas nake. Hikûmeta İslama siyâsi ya HTŞê ya ku ji alîyê dewletêñ emperyalîst ve bi fermî hatîye naskirin, bi lez û bez li dijî gelê me yê Elewî û Xiristîyan êrîş û infaz pêk anî. Bi sedan kes li kolanan û li girtîgehan bi şkenceyê hatin qetikirin. Bermahîyê çeteyêñ DAIŞê mal û milkêñ welatîyan talan kirin. Mafêñ herî bingehîn ên mirovan li alîyekî, mafê jîyanê hate paşguhkîn. Êrîşen zayendî yên li hemberî jinan ên bi rengê destavêtin û revandinê zêde bûne.

Dewletêñ emperyalîst û dewletêñ herêmê yên paşverû hewl didin ku li Şamê hêza İslama siyâsi dîzayn bikin. Çavê xwe ji cîhadîstêñ ku dixwazin wan bikin mêtîngeha darayı aborî ra digire. Her cure sûcêñ çeteyan paşguh dike. Yen ku vê zilma li ser gelê herêmê temaşe dikin hevparê van sûcan in. Divê rîexistinêñ navneteweyî li hemberî êrîşen çeteyan bêdeng nemînin û çeteyen faşîst bê rawestandin.

Serçeteyê HTŞê Ebû Mihemed El-Colanî pêşî bi civîna çeteyêñ cîhadîst a bi navê "Konferansa Serkeftinê" û piştre jî bi rîexistinêñ sexte yên bi navê Kongreya Neteweyî hewl dide desthilatdarîya xwe xurt bike. Rengê cuda yên Sûriyeyê ku mozaîka gelan e, ji pêvajoya avakirina rîveberîya nû ya Şamê dûr dixe. El Colanî di xeta neteweperestîya Ereb da kûr dibe. Ew guhê xwe ji Kurd, Durzî, Elewî, Suryanî, Aşûrî, Êzidî, Ermenî, Keldanî û Tirkmenenê ku doza mafêñ wekhev dikan ra digire. Dewletêñ emperyalîst bi hevkarîya Erebîstan Seûdî, Qatar û dewleta Tirk a



mêtîngehkar hêzaka cîhadîst a desthilatdarîya ava dikin. Di bin desthilatdarîya HTŞê da azadîya jinê tê desteserkirin, daxwazêñ wekhevîya zayendî têñ paşguhkîn û koletî careka din li ser jinan tê ferzkirin.

Tevî hemû bertekan jî, serokê HTŞê El Colanî, çeteyêñ weke "Ebû Hatim el Şakra" ku siyasetmedara jin a Kurd Hevrîn Xelef qetil kir û berpirsiyare sûcêñ li dijî mirovahîyê yên li Efrînê Ebû Emşa, li kêleka xwe digire. Mafê nasname û welatîbûnê dide çeteyêñ cîhadîst ên ku ji welatêñ cuda têñ û di nav refêñ DAIŞê da komkujiyan pêk tînin. El Colanî bi serokê faşîst Tayîp Erdoganê ku Efrîn, Girê Spî, Serê Kanîyê, bajarêñ Cerablûs û Babê dagir kirîye ra dikene û destê xwe dide destê wî. Li hemberî hemû êrîş û dagirkerîya dewleta sîyonist a Îsraqîlê bêdeng dimîne.

DIVÊ RÊVEBERÎYA XWESER BÊ NASKIRIN

Pêwîst e gelê me yê herêmê pişti rûxandina rejîma BAAS, li hemberî pergaleka nû ya yekreng a di bin navê "afirandina Sûriyeyeka nû" da hisyar be. Tu bijardekêñ ku hemû gelên Sûriye bi azadî tê da beşdar nebin û nepejirînin ne çareserî ne. Sûriye ya Sûriyeyîyan e. Divê rîveberîya nû ya Sûriye bi erêkirin û hilbijartina gel bê avakirin. Divê gel xwedî mafê hilbijartin û ji erk girtinê bin.

Rîveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye-Rojava; Serwerîyeka gel a ku li ser meclîs û komînan hatîye ava kir. Di pêşerojê da divê hemû gel û bawerî bi awayekî azad ziman, çand û kevneşopîyêñ xwe pêk bînin. Divê hemû

gelên li xaka şoreşa Rojava yekîtiya xwe ya wekhev, azad û dildar biparêzin. Divê gelê me di avakirina Sûriyeyeka li ser bingeha pergaleka dadmendîya demokratîk û rasteqîn û wekhevîya tam a mafan di hemû waran da rola xwe bilîze. Divê statûya Rîveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye bê naskirin.

Li Sûriyeyaka demokratîk divê pergaleka li gorî rîgeza wekhevîya zayendî û nûnerîya hevpar bê avakirin. Divê rîgezêñ kota, ciyawazîya pozitif û müçeya wekhev a ji bo xebata wekhev a jinan were şopandin. Divê pêkanînêñ ku mafêñ jinan paşve bixin bêñ redkirin, ji bo parastina destkeftîyen jinan tedbirêñ pêwîst bêñ girtin. Divê pergala Sûriyeyaka demokratîk di têkoşîna li dijî desthilatdarîya mîr û tundîya li ser jinê da rol bilîze.

Divê pergala perwerdehîya yekreng û zayendperest bi dawî bibe, hemû ciwan bi awayekî wekhev, azad, demokratîk û bi zimanê xwe yê zîmkînî perwerde bibin. Divê xebatêñ akademîk û zanistî bêñ kirin da ku rê li ber mezinbûna ciwanêñ me ji bo pêşerojeke azad bê vekirin.

Rîveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye daxwazêñ xwe anîn ziman. Xetêñ me yên sor ên li hemberî her plansazîya ku azadîya gelê me dixe xeterîyê dîyar e û em ê tu carî paş da gav navêjin.

Gelê me ne mehkûmê diktatorê nû ye. Ragihandina Rîveberîya Xweser û avakirina hêzîn xweparastinê ji alîyê gelê me yê Durzî ve ji bo avakirina welatekî demokratîk, gelparêz û

azadîxwazîya jinê gelekî girîng e. Gelê me yê Elewî ku pişti rûxandina rejîmê bê rîexistin û bêparastin mabûn, li derdora navendêñ berxwedanê yên nû dest bi kombûnê kirin. Em vîna berxwedanê ya gelê xwe silav dikan. Em bang li wan dikin ku berê xwe bidin Rîveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye û bi hev ra têkoşîn bikin.

Em weke komunîstên Rojava; bang li karker û kedkar, jinan û hemû gelên bindest ên Rojhilata Navîn dikin. Maf û azadîyêñ bingehîn ên hemû netewe û civakêñ bawerîyê yên li bajarêñ Sûriye dijîn di bin xeterîyê da ne. Divê mafêñ gotin, çalakî û rîexistinbûnê bêñ misogerkirin. Divê hemû gelê me ji bo Sûriyeyaka demokratîk li hev bicivin û li hemberî kesen ku dixwazin pêşeroja me destesar bikin hisyar bin. Divê di Sûriyeyaka nû da li ser esasê wekhevîya gelan pergaleka rîveberîya demokratîk û azad bê avakirin. Avakirina jîyaneka nû ya layiqî rûmeta mirovahîyê di destê gelê me da ye. Xweparastin esas e û ji bo gelên Rojhilata Navîn tê wateya jîyanê.

Şoreşa Rojava rîya azadî û jîyanî mirovahîyê ya hemû gelên Rojhilata Navîn e. Li hemberî çeteyêñ bermahîyêñ DAIŞê, dagirker û emperyalîstan rîya yekane yekîtiya berxwedan û têkoşîna gelan e. Divê hemû gelê me, jin û ciwan demildest rîexistinêñ xweparastinê ava bikin û ji bo parastina gund û bajarêñ xwe bikevin nava liv û tevgerê.

Di dawîyê da em şervan û hevreyîn xwe yên ku li enîyên Tişrîn, Qerekozak û Dêr Hafirê li enîyên şer li ber xwe dan û nehiştin ku dewleta Tirk û çeteyêñ wê derbasî axa şoreşê bibin, silav dikan.

Em 8ê Adarê li jinêñ kedkar ên Ereb, Kurd, Ermenî, Êzidî, Suryan, Aşûrî, Durzî û Elewî pîroz dikan.

Werin em têkoşîna Kurdistana Azad û Sûriyeyaka Demokratîk mezin bikin

Bijî şoreşa me ya jin a Rojava

Bijî Rîveberîya me ya Xweser

Berxwedan jîyan e

ÊRÎŞÊN LI SER GELÊ ME YÊ ELEWÎ, ÊRÎŞÊN PLANKIRÎ YÊN JENOSÎDÊ NE!

Elewîyen Ereb ku weke Nusayrî ji têr pêna sekirin, di dîroka Sûriye da di avahîya cîvakî û siyasetê wê da bûne xwedî cihekî girîng. Li Sûriye, piranî li herêmên Lazqîye û Tertûs, li Hums û Hemayê dijîn.

Elewî di dîrokê da rastî êrîşen birêkûpêk, komkuji û koçkirina bi darê zorê hatine. Ji ber vê yekê ji li herêmên çiyayî yê Bakurê Rojavayê Sûriye karibûn hebûna xwe biparêzin. Di heyama yek ji qeyserên Osmanî, Yavuz Selîm da bi hezaran Elewî hatin qetikirin û pişti wê ji van komkujiyan berdewam kir.

Di destpêka sedsala 20emîn da, dema ku împaratorîya Osmanî di Şerê Yekem ê Emperyalîst da têk çû, herêm ket bin destê desthilatdarîya hêza nû ya mêtîngehkar a Fransîyan. Fransayê ji bo ku bi hêsanî bi rê ve bibe herêm li ser bingehêñ etnîkî-nijadî û olî dabeşî weke Dewleta Şamî, Dewleta Helebê, Dewleta Elewî ya li Lazqîye, li ser navenda Durzî- Cebelî Durzî û Sancaxa Îskenderûnê dabeşî 5 dewletan kir.

Li dewleta Elewîyan a ku di sala 1922an da hat avakirin, dadgehan bi awayekî serbixwe li dozan dinêriyan, ji alîyê Fransayê ve Nûsayrîyan ra derfetên baca kêm û hin imtîyazên hiqûqî hatin dayîn elewîyan. Lê Fransayê ev dewlet bi navbeynkarîya rayedarêñ xwe bi rê ve dibir. Di sala 1936an da bi vesazkirineka nû ya Fransîyan çêkirîye weke eyaleta Sûriye hatîye qebûlkirin. Elewî li dijî vê derketin û di pêşengîtya Silêman El Murşîd da serî hildan. Û di encamê da di sala 1939an da careka din serxwebûna xwe bi dest xistin. Di sala 1942an da Lezqîye ji nû ve bi dewleta Sûriye ve hat girêdan.

Di sala 1942an da rîveberîya mandaterîya Fransayê dest bi wendakirina hêza xwe kir. Di sala 1945an da xwepêşandanen mezîn çêbûn. Pişti şerê parvekirina emperyalîst a 2emîn teva geşadanen nû yêni di siyaseta cîhanê da û teva berxwedanen ku zêde dibûn dewleta Fransayê di sala 1946an da mecbûr ma ku ji Sûriye derkeve. Komara Ereb a Sûriye ya li ser bingeha navenda sunîtîyê hate



damezrandin.

Fransayê ji bo parastina berjewendîyên xwe yêni li herêmê, artêşa şerqî ava kir û ciwanên Kurd, Çerkez, Elewî, Durzî û Xiristîyan bir leşgerîyê. Pişti ku dewleta Sûriye serxwebûna xwe bi dest xist ew kesên ku di artêşa şerqî ya Fransayê da cih digirtin ji tevlî artêşa Sûriye bûn. Pileya Elewî û Durzîyan di hîyerarşîya leşgerî da dest bi bilindbûnê kir. Pişti serxwebûnê gelek caran derbeyên leşkerî hatin çêkirin. Pişti her derbeyê mezhebêñ cuda xwestin hevdu tesfiye bikin. Partîyê BAAS ku dirûşmeya wê yekîti, serxwebûn û sosyalîzm bû, lê di pratîkê da neteweparêzê Ereb bû, di sala 1963an da bû desthilatdar. Hafiz Esedê ku di nava partîyê BAAS da çalak bû di sala 1971an da hemû dijberên xwe ji holê rakir û bû serokê dewletê. Di heman demê da bû sekreterê giştî yê Partîyê BAAS. Hemû hêza idarî ya dewlet û partîyê di destê xwe da kom kir. Bi avakirina Enîya Welat a Pêşverû hin partîyên din ji tevlî kir. Rêveberîyeka zordar ava kir.

Di destpêkêda, hin sepanen wek seferberîya xwendin û nivîsandin, reforma axê, ji saziyên dewletê dûrxistina endamên ji malbatê dewlemend ku ji bo gelên Sûriye girîng bû xist merîyetê. Ev di jîyana gelê Elewî da bû sedema hin başkirinan. Lê her ku sal derbas bûn, tebegebûna çînî hîna bêtir dîyarker bû. Desthilatdarî di destê Burjuvayê Sunî û Elewî yêni Ereb da, bi taybetî ji di destê malbata Esad da kom bû. Malbata Esed a ku 53 sal li ser desthilatdarîye ma, nehişt ku gelê Elewî xwe bi rîexistin bike û rîberên xwe derxe. Hikûmeta Esed bingehêka ku gelê Elewî di warê bawerîyê da xwe pêş bixin pêşkeş

nekir. Di pirtûkên wane yêni dibistanan da cih hat dayîn doktrîn-nêrinê sunî-îslamî, lê elewîtî tune hate hesibandin.

Têgihiştina ku Hafiz Esed piştevanê elewîyan e hat afirandin. Heman Esed her tim Durzî û Elewî di bin kontrola xwe da hişt. Esed derfet da bazirgan û karsazê Sunnî yêni herî dewlemend ku 'di berdêla lihevkirin û hevkariya xwe da pere qezenc bikin' û Sunnî ji bi vê rîyê parce kir. Hafiz Esedê ku rî neda tu muxalefali welêt, di sala 1982an da li Hemayê ji bo perçiqandina serhildana birayê Misilman nêzî 40 hezar kes qetil kir. Ji bilî vê, Kurd ji rastî cihêkarî û zordarîya netewî hatin.

Serhildanen gel ên ku di sala 2011an da li Tûnisê dest pê kirin gihaşt Sûriye ji. Gel ji bo azadî û demokrasîyê li dijî dîktatorîya Esed rabûn ser pêyan. Beşeka mezinji gelê Elewî ji piştgirî da serhildanê. Erebê Sûnî û Elewîyan Ereb girîngî didan têkoşîneka hevpar. Rejîma Esed li hember muxalifêñ Elewî pir tund tevgerîya. Hin ji wan qetil kir û cezayêñ giran ên hepsê da hinêñ din.

Rejîmê ji alîyekî ve li dijî gelê ku rabû ser pîyan dest bi sepanina tundîyê kir. Di alîyê din da, hewl da ku vê rewşê wekî şerekî di navbera komên bawerîyê cuda da nîşan bide û ev yek sepan. Di heman demê da êrîşen çeteyêñ cîhadîst ên îslamker ên li dijî Elewîyan û gelên din hişt ku ev pêvajo bizivire şerekî navxweyî etnîkî-nijadî.

Tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriye şoreşeka gel pêk hat û pergaleka gelaparêz-demokratîk hat avakirin. Şerê navxweyî li seranserî Sûriye 14 sal berdewam kir. Heyet Tahrîr El Şam (HTŞ) bi piştgirîya hêzîn emperyalîst û dewletê

herêmê yêni paşverû li Şamî bû desthilatdar. Rejîma Esed bi dawî bû.

Di 27ê Mîjdara 2024an da dema ku di ketina Helebê da "Heleb Sunnî ye" dinivîsand û ji mîr û jînê por vekirî li kolanan dipirsî "Tu Sunnî yî an Elewî?" û li gorî wê nêzîk dibûn, nîşan da ku çeteyen cîhadîst dê çawa nêzî nasname û bawerîyê cuda yê neteweyî bibin.

Îro li Sûriye çeteyen mezhebperest-olî û cîhadîst li dijî gelê Elewîyan Ereb êrîşen birêkûpêk pêk tînin. Elewîyan li Sûriye bi taybet li Lazqîye, Tertûs û Hemayê di hedefa van çeteyan da ne. Mal têr şewitandin, jîn têr revandin, zarok têr qetikirin. Tişte ku li Sûriye diqewime ne şerê navxweyî ye û ne şerê mezhebî-olî ye. Ev berdewamîya qirkirineka plankirî ye.

Elewî li Sûriye di rewşa gelê herî bê parastin in. Parastina can û malê wan tune ye. Ewlehîya wan di bin gefê da ye. Ji ber vê yekê li hemberî komkujiyan Elewîyan ji bilî avakirina rîexistinê xweparastinê û berxwedanê yêni wekî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriye tu rî tune ye.

Îro li Sûriye, êrîşen jenosîdê yêni li dijî gelê Elewî, tenê ne mijareka herêmî ye, di heman demê da parçeyekî pîlanen hevpar ên emperyalîzm û dewletê herêmî yêni mêtîngehkar in.

Li hemberî êrîşen mêtîngehkar, emperyalîst û çeteyen cîhadîst piştgirîkirina berxwedana gelê Elewî û xurtkirina hevgirtinê berpirsîyarîyeka dîrokî ye. Ji bo vê ji divê karker, kedkar û jînê hemû gelên bindest û bawerîyê li Sûriye bi belavkirina şoreşê ya li tevahîya welat, têkoşîna afirandina Sûriyeyeka demokratîk û bidestxistina azadîya gelan berfireh bikin.



Xwendekarêن Şoresê

Li Sûriye, pergala perwerdehîyê li ser sê lingên esasî hatibû avakirin. Ji van lingan; dibistana seratayî ya ku xwendina wê zarûrî bû ji refa 1ê dest pê dikir û heta refa 9an wek du bes berdewam dikir. Dibistana Amadehî, ji refa 10an dest pê dikir û di refa 12an da bi dawî dibû. Her çiqasî ne zarûrî be jî di asteka mezin da xwendevanan dibistana amadehî berdewam dikirin. Di asta talî da jî zanîngehû perwerdehîya bilind hebû. Li gorî dokumentan; berîya şerê navxweyî yê Sûriye; zarokên ku di emrê xwendina dibistana seratayî da ne, ji %93, ji ciwanênu ku di emrê xwendina dibistana amadehîyê da bûn ji %67 xwendina xwe didomandin. Bi giştî, ciwanênu di navbera 15-24 salan da xwendina xwe didomandin ji %95 bûn. Her çiqasî rejîma mêtîngîkar û nijadperest a BAASê perwerdehî bi zimanê Kurdî qedexe û asteng kiribe jî, di nav ciwanênu Kurd da jî asta xwendevanîyê bilind bû. Ev rîje bi giştî pêş me dîkin ku gelên Sûriye, berîya şer girîngîyeka mezin didan xwendinê. Lê perwerde ne demokratik û zanistî bû. Îro roj ji bo parastina mafê xwe yê perwerdehîya bêpere, bi zanist û bi zimanê zikmakî ya di destûra nû ya Sûriye da jî em ê têkoşîna xwe bidomînin, destkeftîyênen şoreşa xwe biparêzin.

Civak bi giştî di rewşeka ne dîyar û bê pêşeroj da dijî. Ev jî dihêle ku ciwan pêşeroja xwe derveyî xwendinê ava bikin. Lê belê, her çi qasî bandora rewşa şerê navxweyî yê Sûriye di vê rewşê da hebe jî, ev rewşeka cîhanî dide xuyakirin. Rewşa perwerdehî ya burjuva ku bi desthilatdarîya burjuazîyê di sedsalênu borî da li seranserî cîhanî serwer bibû, rola xwe

ya berê wenda kir. Di heyama kapîtalîzmê da burjuazîyê hewcehî bi karmendênu ku ji makîneyan fêhm bike, karibe hesabê berhem û peran bike hebû. Girêdayî vê jî di gelek waran da perwerde gav bi gav berfireh kir û demek dirêj wesfa van perwerdeyan, li gorî welatan bigûhere jî, di warê akademîk da baş bû. Hejmara zanîngehan kêm û bi wesf bûn. Lê îro, hejmara zanîngehan û zanîngehêne taybet li tevahîya cîhanê wesfa perwerdehîye daxist. Rewşeka wek "anarşîya hilberînê" derket holê. Ji zanîngehan ji hewcehîyê zêdetir kesen xwedî pîse di besen teng da derdi Kevin. Ev jî dihêle ku hejmara mirovên ku ruxmê xwedî pîse ne lê bêkar in gelek zêde bibe. Bi vê ra jî ciwan dikevin bin metirsîya pêşerojê. Li kêleka ev rewşa şer jî rojane li her dera cîhanê xwe zêdetir eşkere dike. Ev jî hêviya pêşerojê di nav ciwanênu cîhanê da kêm dike.

Şoreşa Rojava, wek şoreşa yekemîn a sedsala 21emîn, di nav cîhanê da bû navenda hêviyê. Gelên li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriye, bi zimanênu xwe û çanda xwe perwerde dîbin. Lê mixabin, wek parçeyek cîhana kapîtalîst, ev bêhêvîti li ser ciwanênu Rojava jî bandora xwe didomîne. Pîşesazî û kargehênu Rojava bi ciwanênu ku dibistan terikandine û bi xwendina 9 salan jî nekirine tijîye. Li kêleka rewşa ewlehîya şoreşê û dorpêça leşkerî-aborî, pergala îdarî-aborî ya ku bi liberalîzma rewşa şer dimeşe, vê rewşê derdixe holê. Şoreş ji seferberîyê şer û alîkarîyê mirovî, derfeta seferberîya xwendinê û çandê nabîne. Ev rastîyeka. Lê li kêleka vê jî ji ber pêvajoya derbasbûyîna çinênu nûjîn, pergala hewcehî bi hêza erzan û bê wesif a karker

dibîne. Piranî sazî û dezgeh, di akademîyen xwe da perwerdeyên kar didin. Ango ji bo mirov di saziyekê da karibe bibe karmend, hewcehî bi xwendina zanîngehê namîne. Li kêleka vê jî, ji ber pêşketina teknîkî, perwerde û pisportîya di karan da jî girîngîya xwe wenda dike. Ev jî di warê xwendinê da bêhêvîtiyê zêde dike.

Lê heke em ne ji alîyê hewcehîyên burjuazîyê, ji alîyê hewcehîyên pêşketina civakî binêrin; zanist û derfetên pêşketî, girîngîya rewşenbîrî û lêkolînê hîn jî zêdetir dîkin. Pêşeroj li ser zanistan bi destê ciwanan tê avakirin. Em baş dizanînu ku ger ciwanênu civakekê bêpêşeroj bibin û ber bi rizînê ve biçin, ew civak ji rizînê xelas nabe. Ji ber vê yekê jî divê perwerdehîya civakê weke navendî bê plankirin û bê rîvebirin. Lê mixabin, ji ber sîyaseta liberalîzmê; ne yênu ku kar dîkin xwe di ewlehîye da dibînîn, ne jî yênu xwe ji kar ra amade dîkin. Hemû karmend û karker ji mafênerî sereke jî bêpar in. Ev jî dihêle ku ciwan xwendinê wek wendadkirina wext bibînîn. Li kêleka vê, bêderfetîyê aborî jî li ser pişta ciwanan dibe bar. Xwendina zanîngehê, li ser xwendevan û malbatênu wan mesrûfekî bêmisogerî derdixe holê. Ciwanênu me, cihê ku pêşketina xwe û ya civakî bikin armanc, karekî ku bikaribin demdirêj berdewam bikin ji xwe ra dîkin armanc. Ev, pêşeroja me qels dike û me tenê di çend waran da li ser lingan dihêle. Divê em, xwe xwedîyê pêşeroja şoreşê bibînîn û di qada xwendinê da xwe pêş bixin. Rast e, bêderfetî gelek in. Lê derfet û pêşketin jî gelek in; berî her tişti em bi zimanê xwe dixwînîn. Dibistan û zanîngehênu me

hene. Îro di zanîngehêne Rêveberîya xweser da; li zanîngeha Rojava 2 hezar 721, li zanîngeha Kobanê hezar 459, li zanîngeha Reqa 595, bi giştî 4 hezar 775 xwendevan perwerde dibînîn. Yekîtiya Xwendekaran, wek nûnerê xwendekaran di nav rîveberîya zanîngehê da cih digire û bi pirsgirêkên xwendekaran ra eleqadar dibe.

Lê pirsgirêkên sereke yênu xwendekaran ên esasî nîşan dîkin û li zanîngehêne nayênu çaresarkirin. Mînak misogerîya pêşerojê, tu pergale kapîtalîst vê derfetê ji bo xwendekaran çenake. Lê sosyalîzm, li gorî hewcehîya civakî xwendekaran dide xwendin û yê ku dixwîne, bi misogerîya kar û pêşeroj dixwîne. Dîsa li tu dera cîhanê, pergale kapîtalîst di zanîngehê da mesrûfa xwendekaran zanîngehê ranake. Lê di pergala sosyalîst da hem xwendin bêpere ye, hem jî hewcehîyên sereke yênu xwendekaran ji alîyê pergala xweser a zanîngehan ve têr pêşwazîkirin. Mînak, xwendekarekî/a Zanîngeha Rojava, heke ji Hesekê biçe zanîngeha xwe ya Qamişlo, nakeve gumana seken-malrê. Dê di pergala sosyalîst da cihê wê-i, hatin çûyîna wê-i û hewcehîyên wê-i alîyê pergala xweser a zanîngehan ve bê dabînîrin. Ango wek hemû pirsgirêkên civakî, pirsgirêkên xwendekaran jî bi pergala sosyalîst têr çaresarkirin. Ji ber vê yekê jî divê xwendekar hîn zêdetir bala xwe bidin naskirina sosyalîzmê û bi dest xistina pêşerojê. Ji bo ku em destkeftinênu xwe yênu ku me bi saya şoreşa Rojava bi dest xistine ber bi sosyalîzmê ve pêş bixin pêwîst e ku em xwe hîna zêdetir pêş bixin, rîexistin bikin û têbikoşin.

1ê Gulanê Roja Yekîtî Têkoşîn Piştgirîyê ya Karkeran e



Her sal 1ê Gulanê weke Roja Karkeran tê pîrozkirin. Encama têkoşîna karkeran a ji bo 8 saetan roja xebatê ye. Federasyona Karkerên Emerîkî di 1ê Gulana 1886an da ji bo roja xebatê ya heşt saetan greva giştî ûlan kir. Nîv mîlyon karker besdari xwepêşandanen li Chicagoyê bûn Xwepêşandan di rojên pêş da ji berdewam kirin. Polisan êrîşî çalakiya 3ê Gulanê kir û karker qetil kirin. Sendikayan ji bo protestokirina vê êrîşê di 4'ê Gulanê da xwepêşandaneka mezin li dar xist. Di vê xwepêşandanê da komkuji pêk hat. Ji 8 karkeren ku weke berpirsiyarên bûyeran hatibûn girtin 4 jê hatin darvekirin, 4 kes jî bi cezayê girtîgehê hatin cezakirin.

Federasyona Karkerên
Emerîkî di sala 1888an da di
civîna xwe da biryar girtin ku
her sal di 1ê Gulânê da ji bo ku
mafa xebata 8 saetan a rojane
bê qebûlkirin xwepêşandan
û calakî bêñ lidarxistin.

Externasyonal 2yemîn ku di sala 1889an da li Parîsê civîya roja 1ê Gulanê weke roja yekîti, têkoşîn û hevgirtina karkerên navneteweyî qebûl kir.

Dî hemû cîhanê da armanca
komunîstan a pîrozkirina
1ê Gulanê bilindkirina asta
têkoşîna çînayeti ya karkeran,
xurtkirin û bilindkirina asta
çîna karkeran û xurtkirina
têkilîyên enternasyonal a
karkerêñ cîhanê ye.

Yek ji van partiyêن ku van pîrozbahîyan lidar dixin partiyê Komunist ya Sûriye ye. Ji wexta damezirandina xwe da ji sala 1924an da heta roja iro pîrozbahîyên 1ê Gulanê lidar xist. Komunîstên Sûrî bi bikaranîna rêbazên cur bi cur ev pîrozbahî lidarxistin da ku ev rêbaz bi merhaleya ku Sûrî tê ra derbas dibû ra hevqirtî be.

Di merheleya dagirkeriya
Firensayê da li Sûriye partîyê
komunîst li dijî dagirkeriya
Frenseyê bi protestoya giştî
daxwaza serxwebûna Sûriye

kirin û ji bo vê têkoşîyan. Di vê serdemê da, partîyê komunîst wek partîyekî serxwebûnê dihat nasîn.

Di sala 1946an da pişti serxwebûna Sûriye ya ku dîkdatorî ji Sûriye derket li du hev derbeyên leşger pêkhatin. Di danezana ku bi boneya "Roja Karkeran" hat weşandin da, Partiyê Komunist bang li kedkaran kir ku li dijî dîktatoriyê têkoşînê mezin bikin, ji bo parastîncı mafêن xwe federasyon û sendikayan ava bikin û besdarî xwepêşandanêن tevahîya Sûriye bibin. Di vançalakîyên ku girseya gel, bataybêt ji karker besdar bûn do banga demokrasî û têkoşînê hate kirin.

Partîyê Komûnîst ê Sûrîyê b
ev rîbaza ku di pîrozbahîyê
Roja Cîhanî ya Karkeran
da bi kar anî, 1ê Gulanê
gihad girseyeka berfireh
a li seranserî Sûrîyê. Partîyê
komunîst di sala 1954an do
derbasî parlementoya Sûrîyê
bû û li herêmên Ereb car
yekem ket parlamentoyê.

Ev yek piştrast dike ku partîyê tenê di salên 1960î ya sedsala borî da karîbû hebûn xwe di qada siyasîya Sûriyê da pêk bîne. Nemaze di serdemec ku Partîyê BAAS serdest bû da, dema ku partiyê Cejnî Karkeran pîroz kir bi armancı perwerdekirina karkeran li ser cîn û nistimanî

Bi ketina Partîyê Komûnîst
a Sûriyê di Enîya Niştimanî
ya Pêşverû bi serokatîyâ

Partîyê BAAS di sala 1970anda di heyama Hafiz El-Esed da, Partîyê Komunîst ê Sûriyê gav bi gav nêzîkatîya xwe ya pîrozkirina Roja Cîhanî ya Karkeran guhert. Şaştîya stratejîya Parfîyê Komûnîst ê Sûriyê ew bû ku hemû çalakîyên xwe yên siyâsi bi vê eniyê ve sînordar kir û bi vî awayî Partîyê Komunîst bingehq xwe vq qel wîndq kir.

Têkoşîna partîyê bi nûnerên wê yên li vê eniyê, hikûmet, meclîsa gel, federasyon û sendîkayan ve sînordar bû. Di encamê da ev meyla di nav komunîstên Sûriyê da bandoreka neyînî li ser pîrozbahîyên Cejna Karkeran kir û vê cejnê karaktera xwe yê şoreşgerî winda kir û veguherî sahîvîyen rotîn.

Piştî avabûna Enîya Welatparêz ya Pêşveçûn pîrozkirina 1ê Gulânê ya komünîstên Sûriye ya li malê wan bû, yan jî li ofisên partîyê bû. Rêbaza pîrozkirina 1ê Gulânê weke semînerên sîyasî dibû. Car caran jî 1ê Gulânê weke seyran li gundan dihat lidarxistin. Di van pîrozbahîyan da têkoşîna li dijî emperyalîzm û sîyonîzmê dihat bilindkirin û doza parastina xeta welatparêziya rejîma Sûriye dikir. Ji ber vê yekê hemû refêن xwe yên şoreşger û piştgirîya gel winda kir û zivirîya partîyekî reformîst ya girêdayî rejîma BAAS. Vê rewşê heta heyama hilweşîna rejîma BAAS a Beşar Esed berdewqim kir.

Ji nunerên TKŞê Cemil Sidwo:

Em ê bi rihê 1ê Gulanê ser bikevin



rejîma BAAS di pratîkê da 1ê Gulanê weke rojeka seyranê girtin dest. Her wiha bingeha vê rojê ya di dîrokê da weke roja karker û kedkaran tê nasîn.

Piştî şoreşa Rojava 1ê Gulanê gihaşt wateya xwe ya bingehîn. Ji hezaran kesan ra hate zelalkirin ku 1ê Gulanê ne rojeka şahî û seyranan e, di vê rojê da bi hezaran mirovan jîyana xwe ji dest dane, di çalakîyên ku hatine lidarxistin da bi hezaran mirovan jîyana xwe ji dest dane, di vê rojê da bi sed hezaran kes ji bo destxistina mafêن xwe daketine qadan û li dijî pergala kapîtalîst têkoşîn kirine.

Piştî şoreşê komunîstan ji bo ku 1ê Gulanê bi wateya xwe yarastî bê pîrozkirin hewldaneka mezin dan. Berî 1ê Gulanan destpêkê di nava karkerên çandinî, şaredarî, karkerên tenduristîyê belavok belavkirin, lafite daliqandin, civînê malan, sempozyûm pêk anîn. Di 1ê Gulanan da teva Yekîtiya Karkeran û saziyên din ên soresê mes calakî û sahî lidarxistin. Çar

caran bi awayekî serbixwe daxuyanî, meş lidarxistin û tevîl pîrozbahîyên giştî bûn. Ji bo ku destkeftinê şoreşa demokratik ku me li Rojava bi bedêlên mezin bi dest xistine ber bi sosyalîzmê ve bê birin bangewazîya mezinkirina têkosînê kir.

Şoreşa Rojava û saziyên şoreşa me mafê karker û kedkaran parast. Lê ev tenê têre nake, pêwîst e ku em di vê qadê da gavên hîna mezintir bavêjin da ku em merhaleya demokratîk a şoresê ber bi sosyalîzmê ve bibin ku em karîbin 100% mafêñ karker u ked karan bi dest bixin. Ji ber ku ev têkoşîn di asta demokrasiyê da temam nabe, heta ku proleter û pergala emperyalî heye ev mijar bi dawî nabe û tu azadîya tam nayê bi dest xistin. Em dibînin ku her ku pergala kapitalîzm û emperyalîzmê mezintir dibe îstîsmara keka karker û kedkaran jî hîna mezintir dibe, nakokîya ked û sermîyanê kûrtir dibe.

Em weke Tevgera Komünîst a Şoreşger bang li hemû karker û kedkaran dikin ku di nava refêن şoreşê de cih bigirin û ji bo bidestxistina azadiya xwe bi rêxistin bibin.



Fermandarê Sor Baran Serhed Nemir e

